ŞERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com | Hejmar: 13 | Dîrok: Tebax 2024 | Biha: 1000 | DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ

EM Ê LI DIJÎ DAGIRKERÎ Û ŞER LI BER XWE BIDIN
EM Ê SER BIKEVIN

Dewleta Tirk a dagirker, hewl dide ku dewletên Sûrîye û Iraqa ku bi salane li Kurdistanê kiryarên mêtingehkar pêk anîne bike şirîkê vê tevdîrê. Dixwaze ku li dijî şoreşa me ya jin a Rojava tifaqeka mêtingehkar pêk bîne. Hevkarîya istixbaratê rejîma Şamê vedixwîne maseya bazarîya ku ava kirîye. Hedefa mêtingehkaran a esasî, dagirkirina axên şoreşê û tesfîyekirina Rêveberîya Xweser e.

Di ev heyama ku em salvegera 12emîn a şoreşa Rojava ya 19ê Tîrmehê pîroz dikin da, di çar alîyê Kurdistanê da agahîyên berxwedanê dihên. Em hevrêyên ku li çîyayên azad û bajaran li ber xwe didin silav dikin. Em ê dewleta Tirk a mêtingehkar, bi hêza berxwedana destanî ya gelê me ji axên Kurdistanê paqij bikin û bavêjin.

Hêz, di gelê me yê berxwêdêr ê welatparêz da ye. Çîyayên azad ên ku bi xwîna hezaran şehîdên me dihê parastin û şoreşa me ya Rojava hêza xwe ji gelê me yê welatparêz digire. Niha careka din, ji bo axên Kurdistan û azadîya gelê me dema serhildanê ye. Divê berxwedana gerîla, li çar alîyê Kurdistanê bi serhildanên gel bihê xurtkirin. Em ê bi berxwedana xwe dawî li ev şerê mêtingehkar bînin.

Heta ku Kurdistana ku mêtingeh azad nebe, dê tu gel azad nebe. Em bangewazîya hemû gelên Rojhilata Navîn dikin ku li dijî ev êrîşên jenosîdkar, dagirker û mêtingehkar têbikoşin. Ev berxwedana ku hêza xwe ji mafdarî û gelê xwe digire, dê teqez ser bikeve. An serkeftin An Serkeftin!

2 NERIN: Dem dema li her derê bilind kirina dirûşma ‘bimre mêtingerî’ ye

3 ROJEV: Em li Kurdistanê li dijî hevkaran, xeta yekbûyî ya azadîxwez mezin bikin

6 CIWAN: Em ji peşengên fêr bibin

8 NIRX: Pêşengê komunîst 30 salîye. Ji hemû gelên me re pîroz be

Dem dema li her derê bilind kirina dirûşma "bimre mêtingerî" ye

Şoreşa me ya Rojava şoreşa azadîya neteweyî ye. Şoreşa me ya Rojava li ser bingeha tifaqa gelên Kurd, Ereb, Tirkmen, Êzidî, Asûrî, Ermenî û Keldanî hatîye avakirin. Şoreşa yekbûyî ya Misilman, Xiristîyan û mirovên ji bawerîyên cuda ye. Şoreşa me ya Rojava şoreşa wekhevî û azadîya jinên ji hemû netew û bawerîyan e. Şoreşa me ya Rojava şoreşa jinê ya sedsala 21emîn e. Şoreşa me ya Rojava di bin dorpêça dij-şoreşger a mêtingehkarîya, faşîst, dagirker a baviksalar da berxwedan û parastina nirxên azadîyê domand. Wesfa xwe ya navenda şoreşgerî ya şoreşa herêmê be parast. Tam ji ber van xisletan ji destpêkê ve di bin êrîşên pergalên kapîtalîst ên dagirker, mêtinger, faşîst û serdestîya mêr da ye. Navenda van êrîşan dewleta burjuva ya Tirk a mêtinger e.

Êrîşên dewleta burjuva yên Tirk ên li dijî Rojava xwedî paşxaneyeka dîrokî ye. Dewleta Tirk xwest xwe weke dewleteka netewî ava bike. Paradîgmaya dewleta burjuvazîya Tirk li ser "yek dewlet, yek al, yek ziman" ava bûye. Ji ber vê yekê jî divîyabû Ermenî, Kurd û Suryanîyên li erdnîgarîya ku lê bûn an bihatana tunekirin an jî Tirkkirin.

Dewleta burjuvazîya Tirk a mêtinger hîna di qonaxa damezrandinê da, li dijî Ermenîyan komkujîyên ku digihêje jenosîdê, Zîlan, Koçgirî û Dêrsimê pêk anî. Û ev komkujî û êrîşên jenosîdê heta îro berdewam kirine. Ji ber ku netewên bindest, bi taybetî jî gelê kurd, ev paradîgmaya dewleta burjuva ya Tirk qebûl nekir. Wan hebûna xwe înkar nekir. Xîyanet li rastî û dîroka xwe nekirin. Li ber xwe dan, xwe rêxistin kirin, şer kirin û li Herêmên Parastina Medyayê, Şengal û Rojava statuya xwe ya defakto îlan kirin.

Di sedsala 21emîn da di çareserîya pirsgirêka kurd ya netewî da du xislet derketine pêş. Yek jê Herêma Federe ya Başûrê Kurdistanê ye, ku PDK û YNK rêbertîhya wê dikin, lê xeta PDKê zêdetir serdest e û ya din jî Rojava ye. PDK ji destpêkê ve weke tevgereka eşîra Barzan a bi pêşengîya Mela Mistefa Barzanî bû xwedî xislet. Di şert û mercên kûrewîbûna emperyalîst da bazarên kapîtalîst bûne yek. Ger rê li ser bingehê netewî ya burjuvazî bidome, cihê ku biçe ew e ku dê bibe girêka vê zincîra kapîtalîst. PDK û rêveberîya wê Malbata Barzanî ev tercîh kirin. Lewma jî di vê xalê da malbata Barzanî bi komkirina sermîyanê ra mijûl dibe, ne bi daxwaz û kurdan ya netewî. Ji bo vê jî dudil nîne ku gel, çîya, ax û avên xwe weke qertekê li ser maseya danûstandinê pêşkêş bike. Ew êdî ne nûnerê gelê kurd e, nûnerê çîna burjuvazîya kurd e. Xîyanet gihiştîye wê astê ku li Iraqê li ser navê dewleta burjuvazîya Tirk a mêtinger ku di dijminatîya xwe ya dîrokî û heyî ya li dijî gelê Kurd de tu sînoran nas nake, xebatên dîplomasîyê yên ji bo Qadên Parastina Medyayê, PKK û Rojava didomîne. Destûr dide ku dagirkerîya leşkerî ya dewleta Tirk a li ser Başûrê Kurdistanê veguhere pêwendîyeka sîyasî. Bi enîya Tirkmenan ra ku rasterast ji alîyê dewleta Tirk ve li dijî YNKê hatîye rêxistinkirin, li Mûsûlê dikeve nava tifaqê. Lê dewleta Tirk a mêtinger ku labelên wê li xwe dikin, cerdevanîya wê dikin, di qereqolên wê de nobedê digirin, Kurdan tune dihesibîne. Ew ciwanên ku li Bakurê Tirkîyê di dawetan da stranên gelêrî yên kurdî dibêjin û direqisin, digre û îşkence dike. Yanî ew qas jî tehamulî kurdan nake. Lê Barzanî tu zirarê nabînin ku hema hema wek leşgerên şefê faşîst Erdogan tevbigerin.

Rêxistina xeta PDKê ya li Rojava ENKSê jî heman xetê dişopîne. Di dema ku hilbijartinên şaredarîyên Rojava boykot dike da, li Efrîn û Serêkanîyê bi çeteyên dewleta Tirk ra hevdîtinan çêdike û li wir buroyan vedike. Li herêmên Rojava yên dagirkirî bi vêxistina agirê Newrozê, propagandaya ku bi rastî mirov dikare bi çeteyan ra di nava aştîyê de bijî, dikin. Tiştekî normal e ku rexneyên wan li şoreşa Rojava hebin. Lê ya ku ENKS dike ne rexne ye, xebata li dijî şoreşê ye. ENKSê xeta şoreşger-demokratîk- rizgarîya jinê ya şoreşa Rojava qebûl nake. Eger dihê bîra we, ENKSê di salên destpêkê yên şoreşê da li dijî hevpeymanîya şoreşa me ya Kurd-Ereb bû, bi awayekî eşkere li dijî pêngavên paqijkirina herêmên Ereban ji çeteyên DAIŞê nerazîbûn nîşan da û ji bo vê yekê çalakîyên dijber pêk anî.

Dewleta burjuva ya faşîst a Tirk a mêtinger baş dizane ku di nava Kurdan de bê îxanet nikare Kurdan têk bibe. Ji ber vê jî bi PDKê û ENKSê ya ku xwe dispêre PDKê ra, ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê veguherîne îlheqê û tunekirina Şoreşa Rojava, hevkarîyê dike. Malbata Barzanî ne xwedî sermîyaneka dîyar bû. Wan ev sermîyan bi bikaranîna derfetên dewletbûnê bi dest xistin. Yanî dewlemendîyên bin erd û ser erd ên Başûrê Kurdistanê îstismar kirin. Hêza wan ne ji sermîyana bihêz, ji desthilatdarîya dewleta Başûrê Kurdistanê dihê. Dewleta burjuva ya Tirk a mêtinger heta ku ji rêgezên xwe yên damezrîner dernekeve rê nade ku li tu parçeyên Kurdistanê dewleteka Kurdî ava bibe. Wê ji hemû cîhanê ra ragihand ku ew vê wekî pirsgirêka xwe ya jîyanê dibîne. Lê wek niha, burjuvazîya hevkar a neteweya Kurd ji bo armancên xwe wek piştgir bikar tîne. Lê gava ku digihîje armanca xwe, sîyaseta hevkarîyê bi zext û îmhayê diguhere. Komara Tırkîye qaşo di makezagona xwe ya sala 1921an da behsa mafên kolektîf ên Kurdan dike, di heman demê da serhildana Koçgirîyê bi qirkirinê diperçiqîne. Ya ku ji Kurdan ra dibêjin mafên kolektîf, komkujîya kolektîf e! Ya ku wê li Başûrê Kurdistanê jî wê bibe ev e. Ji ber ku ger dagirkerî veguhere îlheqê, dê dewleta Tirk walîyên mêtinger tayîn bike û Başûrê Kurdistanê jî mîna Bakûr bike mêtingeh.

Têkoşîna gerîla ya ku nahêle dewleta burjuvaya Tirk a mêtinger li Kurdistan û herêmê weke ku dixwaze bimeşe, hêza gelên demokratîk a şoreşger a li Rojava û vîna gel a li Bakur teslîm nabe ye.

Gelê rêxistinbûyî, berxwedêr û têkoşer têk naçe. Tevî hemû bombeyên nukleer ên taktîkî, pêşketinên teknîkî, xîyanet û hevkarîyê jî gerîla berxwedan û têkoşîna xwe didomîne. Rojavaya ku ji çar alîyan ve hatîye dorpêçkirin, berxwedan û şerê xwe didomîne. Pirsgirêkên gelê me yên aborî hene. Pirsgirêkên pergalê yên şoreşa me hene. Lê belê ger axa ku em li ser bi rûmet bijîn tune be, nirxên ku em ji bo wan bimirin tunebin, ew jîyan ne jîyan e.

Karê herî bingehîn ê îro bi seferberîya tam rêxistinkirina gel û amadekirina wan ji şer ra ye. Ji bo hemû parçeyên Kurdistanê girêka herî krîtîk ev e. Pêşxistina û berfirehkirina têkoşîna yekbûyî ya gelên me yên Kurd, Ereb, Tirkmen, Tirk, Fars, Asûrî, Êzidî û Keldanî gelekî girîng e. Kurdistana Azad; Sûrîye, Iraq, Îran û Tirkîyeya demokratîk e.

Welatparêzên sosyalîst û komunîstên şoreşger divê bi erk û berpirsîyartîya parastin, berfirehkirin û ber bi sosyalîzmê ve meşandina şoreşa Kurdistanê, amadekarîyên 30emîn salvegera Partîya Komunîst a Marksîst Lenînîst bigirin dest. Divê "Bimre mêtingerî/ bijî şoreş û sosyalîzm" li her derê deng vede.

Em Li Kurdistanê Li Dijî Hevkaran, Xeta Yekbûyî ya Azadîxwez Mezin Bikin

Her tim xisleteka dumend ya têkoşîna neteweyî ya ku li Kurdistanê berdewam dike bûye. A yekemîn helwesta li dijî mêtingehkaran; a duyemîn, têkîlîya di navbera hêzên neteweyî da ye. Helwesta li dijî mêtingehkaran, li dijî dagirkerîya sîyasî û aborî berxwedana ji bo azadîya neteweyî ye. Statûya neteweyî; bi xweserî, federasyon an jî serxwebûnê dikare bihê dest xistin. Li vir xala veqetîner; redkirina nîra mêtingehkar a ku Kurdistan kirîye çar parçe ye.

Ên ku li dijî mêtingehkarîyê têdikoşin weke "welatparêz" dihên binavkirin. Burjuvazîya neteweyî ya di bin nîra mêtîngehkarîyê da, bi rehenda ku tevlî têkoşînê dibe xisleteka pêşverû li xwe bar dike. Ên ku berjewendîyên xwe yên kapîtalîst derxistin pêş û bi hêzên mêtingehkar ra hevkarî kirin jî derketin. Ji ber ku hêzên mêtingeh, ger nebin hevkarên mehelî nikarin li cihên dagirkirî xwe bi cih bikin. Ev hêzên ku dibin spartekên mehelî yên mêtingehkaran, her ku vîna xwe radest dikin, di xeta hevkarî û xiyanetê da kûr dibin.

Di sedsala 21emîn da, cewhera têkoşîna neteweyî; li dijî dewleta netewa serdest têkoşîna beşên herî xizan ên netewa bindest e. Ji ber vê sedemê ye ku, xeta hevkarîya burjuvayên ji netewa bindest, xeta qelskirina cewhera şoreşger a têkoşîna gelan û tesfîyekirina wê weke rêya polîtîk dîyar dike.

Li çar parçeyê Kurdistanê eşîran di nav têkoşîna neteweyî da rolên girîng lîstine. Li Kurdistanê yek ji nakokîyên bingehîn a ku têkoşîna navneteweyî dijî ev e. Helwesta eşîran a li gorî berjewendîyên xwe, li her parçeyekî rê li ber cuda şêwegirtina têkoşîna li dijî mêtingehkarîyê girt.

Li her parçeyekî hêzên neteweyî, dema ku li dijî dewleta serdest a ku axa wan îstîsmar dikir têdikoşîyan, hewl dan ku nakokîyên sîyasî yên di navbera dewletên herêmê da, ji bo têkoşîna xwe bizivirînin derfetekê. Bi mêtingehkarên li parçeyên din ra têkîlî ava kirin. Sînorên ku bi hevpeymana Lozanê hatin xêzkirin, têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd parçe kir, cutatîyên di navbera hêzên neteweyî da kûr bûn û weke encam yekîtîya neteweyî nehat afirandin.

Dewleta Tirk a mêtingehkar, ji bo qelskirina têkoşîna azadîyê ya neteweyî ya gelê me, sûdgirtina ji eşîrên li parçeyên din û kirina hevkar a wan esas girt. Îro di alîyekî da li çîyayên Kurdistanê li dijî gerîlayên azadîyê êrîşên tesfîyekirinê berdewam dikin, di alîyê din da malbata Barzanî-PDKê radestî xweferzkirinên sîyasî û aborî bûn. Kûrbûyîna îxaneta PDKê dihê wateya ku êdî bi mêtingehkaran ra berjewendîyên wan ên hevbeş hene. Hevkarîya Barzanîyan, gihaşt asta ku derîyê Başûrê Kurdistanê ji mêtingehkaran ra vekin û bi wan ra hembextî bikin. Pirsgirêk ne tena li dijî hêzên azadîxwaz ên neteweyî ye, di heman demê da bicihbûna mêtingehkarîya kapîtalîst û xebata îlheqê ye.

Hêzên ku di paşerojê da li parçeyekî Kurdistanê şer kirine, dikarîbû li parçeyekî din bi cih bibin, weke qadeka amadekarî an jî paşve vekişînê bikar bînin. PDKê hêzên ku têdikoşin weke gefekê dît ku ev gihaşt heta asta pevçûna PKK-PDKê ku weke şerê "birakujî" dihê binavkirin. Li vir pirsgêrêk ne ku PDKê têkoşîna neteweyî tena bi xwe sînordar dibîne, di têkoşîna neteweyî da xwesteka tesfîyekirina xeta şoreşger-demokratîk e. Dîyarkirina ev xeta hevkar a malbata Barzanî û PDKê ya ku rasterast bi nêrîna teng a neteweyî û berjewendîyên wê yên çînî ve girêdayî ye dê ne şaş be. Pêwîst e ku têkîlîyên navbera hêzên neteweyî wekî gotina Qazî Mihemed bibe: "Kurdistan çar parçe ye û her kurdek ger bixwaze xwedî azadîya dijîn û têdikoşîna li her parçeyekî ye."

Malbata Barzanî, PDKê ya ku rewşenbîrên Iraqê ava kirîye bi komployan xistin destê xwe. Di 1971an da Doxtor Şîvan bi hevkarîya MÎTê qetil kirin. Îro li Bamernêya ku Doxtor Şîvan tê da hatîye qetilkirin yek ji baregehên leşgerî ya herî mezin a artêşa dagirker a Tirk heye. Ji 2020an pê ve Barzanîyan parastina wargeh, rê û qereqolên livbar ên ku dewleta Tirk dixwaze li Qadên Parastina Medyayê ava bike dabîn kir. Ji bo ku bi balafiran bihên lêxistin kordînat û ji bo suîqestên li dijî welatparêzan istixbarat da. Ji 2023an pê ve hêzên taybet en wekî Zerevanî, Gulan û çeteyên peşmergeyên roj ên girêdayî PDKê tevlî êrîşên dagirkerîyê yên dewleta Tirk hatin kirin. Ev piştgirîyên leşgerî yên şênber in. Malbata Barzanî bi feraseta "ji bo ku em karibin herêmê bi rê ve bibin pêwîst e em PKKê tesfîye bikin" bi awayekî eşkere dewleta Tirk rewa dike.

Weke dawî, bi serlêdana Bexdayê ya 3ê Tebaxê a Mesûd Barzanî heyameka nû hat destpê kirin. Hewldana qanahkirinê ya di hevdîtinên ku bi komên Iraqê da, asta radestbûna malbata Barzanî nîşan dide. Xeta Barzanîyan, axên Başûrê Kurdistanê di bin dagirkerîyê da be jî, li ser têkîlîyên ku bi mêtingehkaran ra ava kirine û dewlemendbûnê ava kiriye. Tê zanîn ku li bankayên derveyî welat bi mîlyar dolarên malbata Barzanî ya ku li Başurê Kurdistanê bûye hêzeka olîgarşîk heye. Bi rêjeyeka mezin pereyên wan di bin tehakûma dewleta Tirk da ye. Şerîkeyên kirêkar ên AKPê di bazara Başûrê Kurdistanê da xwedîyê pareka girîng in. Ji 375 hezar bermîl nifta ku rojane ji herêmê tê derxistin, 200 hezar bermîl bi rêyên ne rewa dihê firotin Tirkîye û Îranê. E mayî jî ji bo gelê herêmê tê parzinandin. Qezenca qaçax a niftê ne ji bo pêwîstîyên gel dihê bikaranîn, diherike hesabên bankayê yên Barzanîyan. Hikûmeta Iraqê jî vê rewşê dibîne û vê dike sedema qutkirina butceya herêmê.

Malbata Barzanî û xeta PDKê, li Rojava jî hewl dide ku binê şoreşê bikole. Xeta PDKê ya hevkar ku di bin siwana ENKSê da hebûna xwe berdewam dike, li Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî bîzat bû şirîkê dagirîya mêtingehkarîya dewleta Tirk. Hewl da ku gel dîsa bizivire herêmên dagirkirî. Hêzên PDKê dema ku çeteyên DAÎŞê êrîşa Şengalê kirin bêyî ku li paş xwe binêrin revîyan û bûn sedem ku bi sed hezaran Êzidî di bin gefa jenosîdê da bimînin. Ji bo ku pergala xweser a gelê Şengalê tesfîye bike di navbera Bexda û Hewlêrê da peyman îmze kir. Dema ku hikûmeta Bexdayê, bi piştgirîya emperyalîstan ket Kerkûk û herêmên din PDKê bêyî ku berxwedaneka herî biçûk nîşan bide paş ve vekişîya. PDKê hiha ji bo ku YNKê ya ku di hilbijartinên Kerkûkê da bi ser ket nikaribe bajêr bi rê ve bibe bi hêzên din ên herêmê ve hevkarî dike.

Li çar parçeyên Kurdistanê hişmendîya welatparêzîya neteweyî pêş ket. Bi şoreşa Rojava azadîya neteweyî hat bi dest xistin, gelekî nêzikî destxistina statûyê bûye. Wayê PDKê di pêvajoyeka wiha da xencer li pişta gelê Kurd dixe. Bêyî hesap bi hev ra ditîna bi ev xeta îxanetkar ra li çar parçeyê Kurdistanê dê bi destxistina azadîyê zehmet bibe. Malbata Barzanî û PDKê-ENKSê ne ji bo bi mîlyonan gelê Kurdistanê yên xizan, ji bo berjewendîyên xwe hevkarîyê esas digirin. Ew tena, bi pêşxistina hevkarîya bi mêtingehkaran ra girîngî didin lezandina pêşketina kapîtalîzmê û dewlemendîyên xwe.

Wê demê divê xizanên karker û kedkar ên Kurdistanê ev xeta hevkar mehkûm bikin. Divê ji bo azadîya neteweyî di xeta şoreşger da rêxistin bibin û têkoşînê xurt bikin. Parastina şoreşa Rojava û yekîtîya hêzên azadîyê ji ya her tim hîna girîngtir bûye. Ji bo azadîya çar parçeyê Kurdistanê rêya yekane mezinkirina xeta berxwedanê ya.

Yekîneyên Parastina Jinê (YPJê) Misogerîya vê Şoreşê ye

YPJ di 4ê Nîsana 2013an da hat avakirin. Damezrana wê ya di 4ê Nîsanê da ne rasthatinîyeka. Li ser felsefeya rêberê gelê Kurd Abdulah Ocelan hat avakirin.

Axên Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriye di bin bandora paşverûtîyê da bûn. Jin di bin zexteka giran da bûn. Lê di dema şoreşê da bi pêşengtîya jinên Kurd şoreşa jin pêk hat. Jinan di nava hêzên xweparastinê da xwe rêxistin kirin. Gelek jinên ciwan ji bo ku li dijî çeteyên DAIŞê şer bikin çek rakirin. Dema ku jinên bindest amûrên xwe yên dijwar ji bo bidestxistina azadîyê bi kar tînin, hişmendîyeka din jî diafirînin. Ji ber ku bikaranîna çekan ji bo qutbûyîna rolên ku hatine ferbûyîn a jinan da gavaka mezin e. Tevlîbûyîna şer û berxwedanîya li dijî çeteyên hov di jîyana me serûbin bûyînek afirand. Li vir hebûna YPJê roleka sereke dilîze. Em ji bindestîya malbatê û jîyana eşîrî xilas kir. Em tevlî YPJê bûn û bi wê ra me têkilîyên azad û wekhev ava kirin. Bi hevaltîya jinê vîn û hêza me zêde bû. Em cesaretê ji hev digirin. Zordestîyê cihê xwe da azadiyê.

Salên yekemîn ên şoreşê ji bo jinan gelekî zehmet bûn. Civak destpêkê de neelimî vê yekê. Li gel her jineka ku tevlî YPJê bû civak bi rewşeka nû ra rû bi rû ma. Jinên ku heta duh wekî hêz nedihatin dîtin, îro bi lehengî şer dikirin. Ew jinên bindest ev welat ava kirin. Ji ber vê yekê wateya YPJê mezin e. Jinên ciwan her ku şer kirin xurtir bûn. Gelek şehîd hatin dayîn. Mêran jî dît ku jin çiqasî bi hêz dikarin şer bikin. Wêrekîya jin û jinên ciwan ên di şer da morala her kesî bilind kir. Jinan di şerê li dijî DAIŞê da roleka stratejîk lîstin. Çeteyên DAIŞ'ê çeteyên paşverû yên ku deshilatdarên mêr in. Li ser navê îslamê jin kirin kole. Wan hema hema her tiştê jinan haram ragihand. Bi destê jinekê mirin heram e, bihîstina dengê jinekê heram e, ji destê jinê xwarin haram e. Di şer da jin jî revandin û di sûkên koleyan da firotin. Tecawîz ji bo xwe weke maf ditin. Çeteyên DAIŞê li hemberî jinan gelek sûc kirin. Ev sûcên li dijî mirovahîyê bûn. Çeteyên DAIŞê di serî da ji alîyê dewleta Tirk a mêtinger ve dihatin xwedîkirin. Hêzên emperyalîst her tim bi dizî piştgirî didin.

DAIŞ komeka çete yê dijminê jinan bû. Li cihên ku dagir kiribû destavêtina jinan dikir. Destdirêjî, tacîz, revandin hwd. Jinên Êzîdî li bazarên koleyan difirot. Hîna jinên Êzîdî yên winda hene. Di dîrokê da gelê Êzîdî bi xwedênenasîbûnê hatine sûcdarkirin. Jin û gelê Êzîdî bi mirin û komkujîyan ra rû bi rû man. Yekîtiya Jinan a YJŞê di şerê li dijî DAIŞê da hatîye avakirin. Di 13ê Mijdara 2015an da Şengal ji çeteyên DAIŞê hate rizgarkirin. Bi sedan jinên Êzîdî beşdarî vî şerî bûn. Gelek jinên ciwan ên ku ji alîyê DAIŞê ve hatin revandin û rizgarkirin, di nava yekîneyên YJŞê da berxwedanîya xwe berdewam dikin.

Dema ku DAIŞê dest bi êrîşên xwe kir, dibe ku em di destpêkê da tirsîyan. Hin ji me hebûn ku neçar man koçber bûn. Me malên xwe winda kirin, malbatên me ji hev qetîyan. Û her ku ev şer bi pêş ve diçû, me fêm kir ku ev zordarî tenê bi berxwedanê bi dawî dibe. Tirs tenê me nêzî komkujîyeka din dike. Komkujî, zilm, tundî, şkence, tecawîz hwd hebû. Jin çawa dikarin li hemberî vê xirabîyê bêdeng bimînin? Têkoşîna li dijî DAIŞê di destpêkê da ji bo me pêwîstîyek bû. Dema ku şer kir, me fêm kir ku bi salan me hêza xwe nas nekiribû.

Me bi leşkerîbûnê hêza xwe eşkere kir. Em jinên wêrek in, lê tena cesaret têre nake. Em bêyî rêxistin nikarin li dijî serdestîya mêr û paşverûtîyê şer bikin. Ji ber vê yekê YPJê jî ji bo me misogerîyeka. Ên ku di destpêkê da ji me bawer nedikirin, hêza me bi şehîdên pêşîn ra dîtin. Taburên me yên ku di serî da li Cîndiresê hatibûn avakirin, bi lezûbez li kantonên Kobanê û Cizîr hatin avakirin. Di destpêkê da hem şer berdewam dikir, hem xebatên rêxistinî didomin. Her ku dem derbas bû pergalên me pêş ketin. Bi demê ra hejmara jinên ku tevlî me bûn zêde bû. Me di hemû warên teknîka leşkerî da jî şervan perwerde kirin. Şervanên me yên ku di gelek waran de pispor in hene. Me di gelek waran da, ji çekên ferdî bigire heta pergalên parastina hewayî, wesfên me zêde kirin.

Piştî têkçûna DAIŞê di alîyê tevlîbûnê da kemasî derketin. Disa jî niha hejmarê me zêdetirî pênç hezar e. Dema ku şoreş li ser axa Bakurê Rojhilatê Sûriyê belav bû, bi taybetî jinên Ereb dest bi tevlîbûna YPJê kirin. Gelek jinên ciwan ên Ereb ji be bandora rêgezên eşîrî yên giran derketin û bûn şervanên azad. YPJê îro ji roja ku hatiye avakirin da xwedî avahîyeka pir cuda ye. Jinên ji gelek gelên wek Ereb, Tirkmen, Ermenî, Suryanî û Asûrî niha di artêşa me da dibin şervan. Zarokên van kesan bi hev ra şer dikin û xwîna wan bi hev re tevdigere. Şoreşa rast li welatê kurdan dest pê kir. Weke jinên Kurd bi salan e em li dijî mêtingerîyê li ber xwe didin. Em di vê berxwedanê de gelek tişt fêr bûn. Yekem çirûskên şoreşê li bajarên kurdan qewimî. Lê her ku şoreş mezin bû, me fêm kir ku serkeftinên herî mezin li cihên ku herî zêde jin lê hatine çewisandin dihên bi dest xistin. DAIŞ têk çû û li cihên wekî Reqa, Minbic û Derazorê azadî bi dest xist. Îro jinên wan bajaran çek hildigirin û şoreşê diparêzin.

Em Bi Hevaltîya Jinê Hevdu Hembêz Dikin

YPJê weke artêşa jinê yek ji mînakên pêşeng ên cîhanê ye. YPJê cihê ku jin lê azad dibin û ji serdestîya mêr hesab tên pirsin e. Li vir em bi hevaltîya jinê hevdû hemêz dikin. Em xwe azad dikin û pêş dixin. Zagonên eşîrî, zewacên bi temenê biçûk û tundî hîna jî di civakê da berdewam dike. Ji bo pêşdebirina şoreşa Rojava û parastina van destkeftiyan divê her kes piştgiriyê bide YPJê. YPJê misogerîya şoreşa Rojava ye. Divê hemû jinên ciwan tevlî YPJê bibin. Ev dê ji Tirk a dagirker û çeteyên wê ra bibe bersiva herî baş.

Em ê têkoşîna xwe ya ji bo hemû hevalên xwe yên şehîd Silava ji şehîdê xwe yê yekem heta Arîn Mîrkan, ji Sarya Ozgur heta Sozdaran bidomînin. Em ê ji tevahî kesên ku êrîşa şoreşa me dikin hesap bipirsin. Çawa ku me duh li dijî çeteyên DAIŞê bi awayekî fidatî şer kir, em ê îro jî li dijî her cureya êrîşan şoreşa xwe biparêzin. Em ê Serê Kanîyê, Girê Spî û Efrînê rizgar bikin. Ew axa me ne. Li van erdan cihê çeteyan tune ye! Em dizanin ev şoreş çawa hatiye afirandin. Ev şoreş hem ji bo me hem jî ji bo jinên cîhanê hêvîyeka. Em ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe şoreşê biparêzin!

Em Hewldana Sixurkirinê ya Dijmin Dikarin Bi Rêxistinbûnê Vala Derxin

Dewleta Tirk a faşîst mêtingehkar ku dijminê şoreşa Rojava yê herî mezin e, ji bo tunekirina Rêveberîya Xweser xebatên sixurkirinê zêde dike. Dixwaze şoreşê ji hundir ve qels bike û pêşengên wê bi êrîşên sûîqestê qetil bike. Dewleta Tirk ji bo vê hewldana afirandina îxanetkaran dide. Dewleta Tirk, bi rêya sazimana istixbaratê bi bikaranîna agahîyên ku derheqê jîyana şexsî ya şexsan da bi dest xistîye armanç dike ku wan istismar bike û bixe kemînê. Hewl didin mirovên ku bi sedema şer xwe li Tirkîye girtine, bi rêya alîkarîyan qanah bikin û bikin sixur. Bi piranî bi rêya gefan dihên zor li wan dihê kirin ku ew bibin sixur û bi zorê agahî kom bikin. Ji bo sixurtîyê şkenceya derûnî dihê ferzî mirovan kirin. Bi mirin an jî xistina zindanê dihên tehdîdkirin. Di hinek rewşan da li ser mêriv an jî mêrivên girtîyên zindanan rastî tehdîtan dihên.

Di heyama dawî da rêbaza komkirina agahîyan a ku Sazimana istixbarata dewleta Tirk herî zêde bi kar tîne; li ser têlefonan şandina lînkên (têkîlî) bi veyrûs e. Dijmin, li ser reqemeka têlefonê ya ji rêzê lînkekê dişîne. Di van lînkan da naverokên li gorî qadên eleqedarîya mirovan hene. Ev di hinek deman da dîmenên jin û mêran in. An jî dîmenê sîleh, tizbî, çexmax an jî erebeyekê ye. Dîmen bi piranî ne zelal e. Li bendê ye ku tu modêla erebe an jî sîlehê meraq bikî û wê lînkê vebikî. Di salvegera avabûna partîyê da mesajeka bi das û çekûç dişîne lê ne zelal e. An jî sûretên Newroz û hevrêyên şehîd hene, tu bi coş meraq dikî, vedikî. Veneke! Di 8ê Adarê roja jinên kedkar ên cîhanê da di bin navê mesaja pîrozbahîyê da dişîne. Mesajên ku ji kesên ku nas nakin dihên venekin. Ji bîr neke valahîyeka kêlîyekê, dibe cihê ku dijmin istixbarata xwe lê kûr dike.

Baş e dema ku tu veke çi dibe? tema ku ew lînk bihê vekirin nivîsbarîya bi veyrûs di têlefon, tablet an jî kompûtir da bi cih dibe. Hemû bernameyên ku di têlefona we da, agahîyên şexsî û dane dikevin bin şopandinê. Di bernameya whatsap, telegram an jî kîjan bernameyê da tu ji kê ra dinivîse dijmin jî teva te dikare têlefonê bikar bîne. Carna li dewsa te ji hevalên te ra mesaj dişîne û piştre ji têlefona te sîl dike û bi vî awayî belav dibe. Mayk an jî kemîraya têlofona we dikare bihê qontrolkirin. Yanê di kemîraya te da cihê ku tu lê dişopîne, axaftinan guhdar dike. Ji ber vê sedemê lînkên ku ji kesên ku hûn nas nakin qethî venekin.

Dijmin ji bo ku ciwanan bixe kemîna xwe hişbir bikar tîne. Berî bêpere dide wan û tîne rewşa bendewarîyê. Piştre bi pere difiroşe. Ger ku tu nikaribe bikire, tîne ser ziman ku tu MÎT ra bixebite. Bi alîkarîya dayikeka welatparêz ev rêbaz derket holê. Dijmin kesê ku dixwaze bike sixur destpêkê dike bendewarê hişbir, piştre jî ji wan kordînatên sazîyên şoreşê û noxteyên leşgerî dixwaze. Ew kes vê ji dayika xwe ra dibêje û ew dayik vê ji saziyên şoreşê dibêje û ev rêbaza sixurkirinê derdikeve holê.

Di heyama dawî da bernameyên sohpetê yên ku belavbûne hene. Di van bernameyan da ger ku ji bo demekê kemîre vekirîbe mîqdarek pere dihê razandin hesabê te. Di cîhana kapîtalîst da kî bê beramber pere dide kê? Elbet armanceka wan heye. Dewlet mirovan dineqînin. Ji bo ku alîyên mirovan ên lawaz fêr bibin û xebatê pêşnîyaz bikin agahî kom dikin. Bi tiştên ku di kemîrê da dibînin û dibîhizin hewzeka agahîyê pêk tînin. Dijmin, bi rêya agahîyên şexsî an jî gefa zirar dayîna malbatê wan dixe destê xwe. Nîqaşa ku ev bername bê zirar in bê wate ye.

Axaftinên vala xizmetî dijmin dikin. Kîjan kadro kengî hat, kengî çû kuderê? Ji çi hez dike, ji çi hez nake? Li malên kê dimîne? Kîjan erebeyê bi kar tîne? gelo têlefon bi kar tîne an jî na? Erk û berpirsîyartîya xwe çiye? Sohpetên ku ev agahî tê de derbas dibin diherike hewza istixbarata dijmin. Agahîyên nelazim ku derûdorê dihên bikaranîn dizivirin sûîqestên ku partî û şoreşê hedef digirin. Dijmin bi awayekî çavsorî van agahîyan kom dike û ji bîr nake.

Em hinek mînakan dibînin. Zarokên ku ji serî da weke ENKSyî û dijminê şoreşê hatine mezinkirin hene. Dijmin zarokên kesên ku welatparêzîyê bêpar in hîna hêsantir dike sixur. Divê malbatên me fêrî zarokên xwe bikin ku îxanet pûçbûneka çawa ye? Divê em hezkirina welat û gel fêrî zarokên xwe bikin. Divê zarokên me fêm bikin ku di cîhana kapîtalîst da pere roleka çiqasî qirêj dilîze. Sixurên ku ji bo çend dolaran sûretên noxteyên kontrolê yên asayîşê an jî sazîyên leşgerî firotin derketin. Dijmin, ji bo ku fêrî kar bike destpêkê jixwe agahîyên noxteyên ku dihên zanîn dixwaze. Nebêjin tiştek nabe. Zebûnîbûn bîreka bêdawî ye. Dema ku tu bikeve dijmin careka din nahêle tu ji wir derkevî. Dijmin carnan bi gotina “em ê te ji hevalan ra bêjin” hîna zêdetir ditirsîne û te hîna zêdetir dixe nav lepên xwe.

Şoreşa me di bin embargoya aborî û dorpêçîyê da ye. Dijmin berê êrîşên dagirkerîyê dide sazîyên şoreşê. Ji ber ku hewl dide ji bo gelê herêmê jîyanê hîna zehmettir bike. Pêwîst e em li dijî zehmetîyan bibiryar bibin. Dijmin, dizane mirovên bêrêxistinkirî dikarin axa xwe biterikînin. Cîhaneka xeyalan a derew ava dike. Dibêje dema ku tu bi me ra bixebite em ê te ji Tirkîye derxin Ewropayê, jîyaneka te xweşik dibe. Ew qasî dixemilîne ku mirov ji wan bawer dikin. Jineka ku bûye sixur, îtîraf kir ku her roj li ser têlefonê li bajarê Antalyayê sûretê xanîyekî pir xweşik ê li kêleka behrê jê re hatîye şandin û bi xeyalê wî xanî xebatên sixurtîyê qebûl kirîye. Nafikire ku axên xwe, gelê xwe difiroşe, tenê xwe difikire. Lê ev gîştî dereweka mezin e.

Di hinek îtîrafan da hat dîtin ku sînorê dejenerebûn û pûçbûnê nîne. Kesên ku mirovên ji malbata xwe firotin derketin. Dayik û jinên ciwan her roj di destê îxanetkaran da rastî destdirêjîyê dihên. Divê kes nefikire û nebêje ku ez bêkar bûm, feqîr bûm, ez mecbûr mam. Mirov bi rûmeta xwe dijî. Tu hecetên vê nabe.

Hinek îxanetkar jî di erkên hîna pinî da dihên erkdarkirin. Hewl didin ku di nav tevger û sazîyan da bêaramî, bêbawerî derxin. Xirapkirina dorhêla aramî ji xwe ra dikin armanç. Di bin navê rexneyê da şoreşê û sazîyan reş dikin. Armanç li dijî şoreş û kadroyan fîtkirina gel û dûrxistina ji şoreşê ye. A girîng di demên zehmet da xwedî derketina şoreşê ye. Em bi vî awayî dikarin sixuran derxin holê.

Dijmin bi van rêbazan dixwaze şoreşa me têk bibe û tune bike. Ew naxwazin gelê me li ser pêşeroja xwe bibin xwedî mafa gotinê. Ji bo mezinbûna şoreşê divê em li dijî van kemînan şîyar bibin. Divê derdora xwe şîyar bikin, van fêrî zarokên xwe bikin.

Weke Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) bangewazîya me ji gelê me re rêxistinbûn e. Divê rexmê dijmin em rêxistin bibin. Hewldanên hilweşandina şoreşê, pûçkirina ji hundir ve û dagirkirina axên me encax em dikarin bi hîna zêdetir rêxistinbûnê vala derxin. Îxanetkar û zebalêyên ku hewl didin xwe di nav me da veşêrin encax dema ku em bibin yek em dikarin têk bibin. Em tu carî ji bîra nekin, tu hêz nikare gelekî rêxistinkirî têk bibe.

EM JI PÊŞENGÊN XWE FÊR BIBIN

Jinên Ciwan ên CKŞ'yî li Kobanê li dijî êrîşên dagirkerîyê yên dewleta Tirk û PDKê ya hevkar yên li ser Başûrê Kurdistanê çalakîyek lidar xistin. Di çalakîyêda bangewazîya avakirina rêxistinên xweparastin û rêxistinbûna di nav refên CKŞê da hat kirin.

Di serî da em ji xwe bipirsin gelo ciwantî çima girîng e û çima her tişt bi ciwantî ava dibe?

Weke ku dihê zanîn em di hundirê civakeka ku li ser çanda kapîtalîst ava bûye mezin bûne. Di heman demê da çanda eşîrtî bandoreka pir mezin li ser me ava kirîye. Ji ber vê yekê em dibêjin dê nifşên nû bandoreka pir mezin li ser vê şoreşê bikin.

Me di nivîsên xwe yên berê da jî li ser mijarên hêmanên ku bandor ciwanan dike axivîn. Mijara şerê taybet ji van a herî sereke ye.

Ji ber vê yekê em dixwazin hemû ciwan girîngîya rola xwe ya di şoreşê da zanibin. Gelo çima herkes dixwaze hebûna xwe li ser ciwanan ava bike û xwe ferzî vîna wan bike? Gelo tu kesî di vê mijarê da pirs ji xwe kirin?

Ciwanên hêja wekî ku malbata we bi çanda xwe ya eşîrtî ve girêdayi ne û li ser çanda pergala serdestîya mêr û jineka kevneşop dixwazin we perwerde bikin bizanibin ku ev qalibên pergala kapîtalîst in. Ev tişt weke pêwîstîya jîyanê dihê dîtin. Lê di rastiyê da ev hilweşandina ciwantîyê û windakirina nirxa mirovatîyê ye. Ji ber ku kapîtalîzm hemû nirxên eydî mirovatî û ciwantîyê tune dike. Kapîtalîzm tena ji bo hebûn û berjewendîyên xwe şikil dide mirov û mirov ji mirovatîya xwe dûr dixe.

Ji ber vê yekê pêwîst e ku ciwan rola xwe baş zanibin û jîyana xwe li gorî vê sererast bikin û li dijî ev rastîya civakê têbikoşin. Berî şoreşa Rojava denga ciwanan hatibû birîn, nasname û vîna ciwanan hatibû windakirin. Di civakê da tu nirxa gotina ciwanan tunebû. Lê piştî şoreşa Rojava, di serî da ciwanan pêşengtîya şoreşê kirin, di şoreşê da hêza xwe dîtin û hêz ji şoreşê girtin. Ev yek ji bo ciwanan bû çavkanîya moral û cesareteka mezin.

Her ku şoreş pêş ket ciwanan hebûn û vîna xwe hîna zêdetir di şoreşê da dîtin. Ji ber vê yekê ciwanan bi taybetî di qada leşgerî û hem jî di qada sîyasî û civakî da bi awayekî xurt cihê xwe girtin. Bi hezaran ciwanan ji bo pêşeroja xwe ji bo vê şoreşê bedel dan, bedena xwe dîyarî azadîya axa xwe kirin.

Ciwanan teva cihgirtina di enî û sengerên herî pêş da, di gelek waran da xwe pêş xistin û hîna bêtir xwedî li şoreşê derketin. Dewleta Tirk a faşîst û çeteyên wê, di heman demê da dewletên emperyalî qasî ku hewldana xenikandina şoreşê didin, ew qasî jî dixwazin vîna ciwanan bişkînin û wan ji şoreşê dûr bixin. Ji ber vê yekê cur bi cur rê û rêbazan bikar tînin. Bi vekirina derîyên koçberî û belavkirina bikaranîna hişbir rêbazên herî sereke ne. Pêşketina teknolojî û şêweya bikaranîna vê ji bo dijmin dibe derfeteka mezin. Dîsa çanda kapîtalîst a reklamên li ser têlevîzyon û medyaya civakî, belavkirina çanda moda ji van cureyên rêbazên ku dijmin bi kar tîne ye. Bi vê yekê ji xwe ra dikin armanç ku mêjîya ciwanan mijûl bikin û di kesayeta ciwanan da kesayeta mirovê kapîtalîst ava bike. Ji bo vê yekê em dibêjin pêwîst e ku ciwanên me rola xwe bizanibin û di heman demê da destkeftiyên xwe biparêzin. Di her şoreşekê da, di her civakekê da ciwan beşa herî dînamîk in. Ji ber vê yekê ciwan nûnertîya pêşerojê dikin.

Îro hîna bi hezaran ciwanên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan û hwd. di nav refên leşgerî da cih digirin û şoreşê diparêzin. Destkeftiyên vê şoreşê ji bo ciwanan derfeteka gelekî mezin e. Heta serdema lidar ketina şoreşê bi hezaran ciwan ji mafa herî rewa ya perwerdeya bi zimanê dayikê bêpar bû. Lê bi saya şoreşê perwerdeya bi zimanê dayikê bû destkeftina sereke. Niha di hemû dibistan û zanîngehan da zimanê kurdî û hemû ziman zimanê perwerde ne. Dijmin dixwaze vê destkeftina ciwanan ji holê rake. Ji bo vê yekê derîyên koçberîyê ji ciwanan ra vedike ku ciwan berê xwe bidin welatên derve û karibe wan ji ziman, çand û dîroka xwe dûr bixe. Dema ku ev berê xwe didin Tirkîye an jî welatên din ên kapîtalîst jî bêyî ku jîyaneka xweşik pêşkeşî wan bike, wan weke hêza kar a erzan bikar tîne û li ser keda wan ciwanan bi mîlyon dolaran pere qezenç dike.

Lê îro di alîyekî da ciwanên me yên ku îro li ser vê xakê dijîn jî di qadên xebatên wekî sîyasî, leşgerî û civakî da bi cih bûne. Êdî denga me digêhêje hemû cîhanê.

Rêxistina Ciwanên Komunîst ên Şoreşger (CKŞ) jî yek ji desketineka girîng a vê şoreşê ye. Me jî weke ciwanên komunîst di her qadekê da bedelên giran dan. Ji ber vê yekê em hebûna ciwanan a di hundirê vê şoreşê da girîng dibînin. Ji ber ku vê şoreşê bi keda ciwanan destpê kir û dê bi keda ciwanan jî bi ser bikeve. Ji ber vê yekê em dibêjin Ciwan Pêşeroj e Pêşeroj Sosyalîzm e.

Ciwanên hêja wekî ku hûn dibînin dijminê me bi êrîşên rojane dixwaze di dil û mejiyê me de tirseka mezin ava bike. Dijmin gelekî baş dizane ku ev nifş li ser exlaqa şoreşê û di nav şoreşê da mezin bûye. Yanê dijmin dixwaze qabîlîyeta guhertina gelekî xurt e. Ji ber vê yekê dixwaze bi êrîşên xwe vîna me bişkîne. Pêwîst e weke duh îro jî em weke ciwan li dijî dijmin bibin mertal û van êrîşan vala derxin.

Em weke Ciwanên Komunîst ên Şoreşger bang li hemû ciwanan dikin û dibêjin; werin xwe di nav refên CKŞê de birêxistin bikin ku em bi yek dest û yek rih rêbazên dijmin têk bibin. Rola we di avakirina vê şoreşê de girîng e. Ev şoreş zarokê xwe dixwaze. Em nehêlin ku dijmin bigêhêje armanca xwe. Pêwîst e ku em di vî milî da ji jîyana pêşengên xwe yên wekî Destan Temûz, Ivana Hoffmann Zîlan Destan, Metîn Dîcle, Firat Newal fêr bibin û xwedî li keda wan derkevin.

Leyla Xalid: Niha dema zarokên Filistînê ye

Nûnera Enîya Rizgarîya Gel a Filistînê Leyla Xalid wek mêvana taybet beşdarî 7emîn Civîna Navneteweyî ya Lîga Enternasyonal a Têkoşînên Gel (ILPS) bû ku di dawîya meha Hezîranê de li Malezyayê hat lidarxistin. Leyla Xalid bal kişand ser girîngîya têkoşîna çekdarî ya ji bo azadîya neteweyî û bal kişand ser çawanîya piştgirîkirina berxwedana gelê Filistînê ya li Xezzeyê.

Têbinîyên axaftina Leyla Xalid wiha ne:

Em bedelên mezin didin. Zêdeyî 30 hezar ji wan, piranîya zarokên me tevî bav, dê û dapîr û bapîrên xwe hatin qetilkirin. Bi her bombeyê Îsraîl bi desteka rêveberîya DYEyê bi çekên Emerîkayê qetlîaman dike û dixwaze nifşekî tine bike.

Li Xezzeyê jîyanê dikujin. Xezze li hemû cîhanê mirovahîyê diparêze.

Ne tenê Hamas, hemû gelê me li ber xwe dide. Ji ber vê yekê Xezze van rojan piştgirî dide herêma azadîyê. Piştî 7ê Cotmehê êdî hemû cîhan Xezze ye. Niha dema Filistînê ye. Niha dema zarokên Xezzeyê ye. Dema jinên ku ji alîyê Îsraîl û hevalbendên wê yên Ewropayê ve tên qetilkirin e.

Hikûmetên zalim ên ku li her derê dinyayê zilmê dikin tecrîd bikin. Divê em bi boykotkirina sûcdarên şer dengê xwe bilind bikin. Divê em wan boykot bikin. Em mirov dikarin bi karanîna amûrên cûda gelek tiştan bikin. Lê ya ku bi rastî girîng e şoreşa çekdarî ye.

Niha li Xezzeyê ne şînkatî, ne av û ne jî tiştek heye. Lê ew hîn jî li wir in. Pêdivîya me bi piştgirîya we heye. Em bang li we dikin ku Xezzeyê ji nû ve ava bikin. Tu çi dikarî bexşînî wê bexşîne. Ew niha hewcedarê bexşên we ne.

Ez her tim di wê bawerîyê de me ku şervanên azadîyê dikarin ji bo gelên din ên di şer de piştgirî bikin, amûrên xwe biafirînin.

Ji TKŞê bangewazî; Wextê serhildana li hemberê dagirkerîyê ye

Tevgera Komunîst a Şoreşger (TKŞ), êrîşên dagirkerîyê yên dewleta Tirk a faşîst a mêtinger yên li ser Başûrê Kurdistanê li Hesekê protesto kir. Fadya Sîdo da zanîn ku bi alîkarîya PDKê dagirkerîya li ser xaka Kurdistanê berfirehtir bûye û dîyar kir ku gundên herêmê hatin valakirin û welatî neçar man koç bikin. Fadya Sîdo dîyar kir ku dewleta Tirk li dijî gelê Kurd êrîşeka qirkirinê pêk anîye û wiha got: “Dewleta Tirk a mêtinger dixwaze herêmeka berfireh heta Heleb, Mûsil û Kerkûkê ku xeyala wan a Osmanî ya bi sedsalan bû, bi xwe ve girêbide. Malbata Barzanî di berdêla berjewendîyên teng ên malbatî da azadîya gelê Başûrê Kurdistanê firot. Divê gelê me yê çar parçeyên Kurdistanê li hemberî xîyaneta PDKê bêdeng nemîne. Divê dev ji vê hevkarîya dagirkerîyê ya rezîl berde.

Em hevrêyên ku li çîyayên azad û bajaran li berxwe didin silav dikin. Em ê bi hêza berxwedanê ya dastanî ya gelê xwe dewleta Tirk a mêtingehkar ji axa Kurdistanê paqij bikin. Hêz di destê gelê me yê welatparêz ê berxwedêr da ye. Çîyayên Kurdistanê yên azad û şoreşa me ya Rojava ku bi xwîna hezaran şehîdan hatine parastin, hêza xwe ji gelê me yê welatparêz digire. Niha careka din dema wê yekê ye ku em ji bo azadîya axa Kurdistanê û gelê me bi biryar rabin serhildanê.”

Şehîdên Pirsûsê li axa şoreşê hatin bîranîn

Ciwanên Komunîst ên Şoreşger (CKŞ) di 9emîn salvegera Komkujîya Pirsûsê da li bajarên Kobanê, Hesekê û Qamişlo yên Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê çalakîyên bîranînê li dar xistin.

Di axaftinên di çalakîyan de hat destnîşankirin ku xeyalên 33 şehîdên Pirsûsê li xaka şoreşê şîn bûne û hat gotin, “Nikarîn derbasî Kobanê bibin, li ser sînorê Pirsûsê ji alîyê dewleta Tirk û çeteyên DAIŞê ve hatin qetilkirin. Lê nemirîya 33 şehîdan bû parçeyek ji serkeftina Kobanê.”

12emîn salvegera şoreşa Rojava hat pîrozkirin

Li bajarên Bakur û Rojhilatê Sûrîyê bi beşdarîya bi hezaran kesî bi boneya 12emîn salvegera şoreşa jin a Rojava şahî hatin lidarxistin. Di çalakîyan da hate destnîşankirin ku têkoşîna parastina şoreşa Rojava wê bidome û gerîlayên li çîyayên Kurdistanê li berxwe didin hatin silavkirin.

Çalakîyên TKŞê yên di salvegera Komkujîya Şengalê de

Tevgera Komunîst a Şoreşger (TKŞ) bi boneya salvegera Komkujîya Êzidîyan a 3ê Tebaxê li Qamişlo, Hesekê û Kobanê çalakî li dar xist.

Endamên TKŞê li Xaçerêya Medîne Şebab a Qamişlo daxuyanî dan. Di daxuyanîyê da hate dîyarkirin ku gelê Şengalê 10 sal in di bin êrîşên dagirkerîyê de li ber xwe dide û bang li hemû gelên cîhanê hate kirin ku ji bo pêşîgirtina li komkujîyên nû yên li ser gelê Êzidî, hevgirtinê mezin bikin.

TKŞê li Hesekê û Kobanê bi rojeva ”rûbirûbûna mêrtîya civakî” civîn li dar xist û bal kişand ser komkujî û êrîşên zayendî yên li hemberî jinên Şengalê.

Pêşengê Komunîst 30 salîye. Ji Hemû Gelên Me Re Pîroz Be

MLKP ya ku di 10ê Îlona 1994an da bi yekbûna partî û rêxistinên komunîst hat avakirin, bû partîya karker, kedkar, jin û ciwanên ji netew û bawerîyên cuda. Ji bo tevgera şoreşger û bindestan hêvîyek wisa çêkir ku me navê vê pêvajoya damezrandinê kir Şoreşa Yekîtîyê. Şerê azadîyê yê pêşengê me yê komunîst di 10ê Îlonê da wê bikeve sala xwe ya 30emîn.

Partî doza şoreşa yekgirtî ya Tirkîye û Kurdistanê dike. Ji bo yekitîya çar parçeyê Kurdistanê şer dike û dixwaze şoreşê belavî tevahîya Rojhilata Navîn bike.

Partî di salên 1990î da dema ku têkoşîna antîfaşîst bilind bû, bû sembola têkoşîna li dijî faşîzmê. Li bajarên Tirkîyeyê pêşengîya serhildanên mezin kir. Hêzên me di grevên karkeran, meşên jinan, mîtîngên miwazifan, boykotên xwendekaran û li qadên 8ê Adarê, Newroz û 1ê Gulanê da ala sor a şoreşê bilind kirin. Di vê têkoşîna ku 30 sal berdewam kir da komunîstan agirê şoreşê geş kirin. Şervanên me bi dehan çalakîyên çekdarî pêk anîn û ji faşîstan hesab pirsîn.

Partî ji bedeldayîna ji bo şoreşê xwe dûr nexist. Dijmin ji bo pêşî li pêşketina partîyê bigire dest bi êrîşên girtinê kir û kadroyên me yên pêşeng qetil kir. Lê partîyê yek gav jî paşve navêt. Pêngavên xurt pêk anî. Ji Stenbolê heta Amedê, ji Dêrsimê heta Antakyayê li qadeka berfireh xwe rêxistin kir.

Li ser xeta welatparêzîya sosyalîst, li dijî pergala faşîst a mêtingehkar têkoşîneka bibiryar meşand. MLKPê di dîroka xwe da bi berfirehkirina têkoşîna şoreşgerî bersiv da hemû êrîşên dijmin.

Gerîlayên me yên li Akademîya Hüseyin Demircioğlu ya li Qadên Parastina Medyayê hatîye avakirin, perwerde dîtine, li çîyayên Xakurkê, Zap, Metîna, Dêrsim û Serhedê bi ser dijmin de meşîyane.

Partîyê me, fikra şoreşa jinê pêş xist. Bi damezrandina Rêxistina Jinên Komunîst gavên xurtkirina têkoşîna azadîya jinê li dijî serdestîya mêr hatin avêtin. KKÖ rê li ber jinan vekir ku bibe navenda têkoşîna şoreşgerî.

MLKPê di Şoreşa Rojava ya ku di 19ê Tîrmeha 2012an da destpê kir, ji rojên destpêkê da cih girt. Ji bo avakirin û parastina şoreşê ked û bedel da. Hevrêyê me Serkan Tosun ku di nava komên yekemîn da derbasî Rojava bû, di 14ê Îlona 2014an da di şerê Serêkanîyê de bû nemir. Rêheval Serkan li Rojava bû yekemîn şehîdê MLKPê.

Partîya me MLKPê di sala 2013an da li Stenbolê di çalakîyên Parka Gezi da bû pêşengê gel. Hewl da ku hêza Gezîyê bi berxwedana gel a Kobanê ra bike yek. Dema ku di berxwedana Kobanê da li dijî çeteyên DAIŞê şer dikir, bi hemû hêza xwe beşdarî Serhildana 6-8ê Cotmehê ya li Bakurê Kurdistanê destpê kir, bû.

Partîyê şervanên xwe weke yekîneya fidayî ya şoreşê bi nav kir. Di dema ku yek ji fermandarên me yên jin Şehîd Sarya li Kobanê bû nemir, bû yekemîn şervana jin a komunîst ku di nava axa şoreşê da şehîd ket. Partîyê dirûşmeya şehîd Sarya ya "Karê şoreşger çêkirina şoreşê ye" hilda.

33 rêhevalên me yên ku ji bo ji nû ve avakirina Kobanê ji Tirkîye û Bakurê Kurdistanê hatin Pirsûsê di êrîşa çeteyên DAIŞê da nemir bûn. Her sal di 20ê Tîrmehê da em dîyar dikin ku me dest ji xeyalên wan bernedaye û em şoreşa Rojava mezintir dikin.

Komîteya Navendî ya MLKPê ji bo parastina şoreşê bangeka taybet li kadroyên xwe kir. Bi vê bangê bi dehan endamên partîyê yên ji Ewropa, Tirkîye û Kurdistanê berê xwe dan Rojava. Di tabûrên Şehîd Serkan û Şehîd Sarya yên li Serêkanîyê hatin perwerdeya leşkerî dîtin. Bi lez û bez çûn enîyên şerê li dijî DAIŞê. Şervanên komunîst di enîyên herî pêş da beşdarî hemû pêngavên li dijî çeteyên DAIŞê bûn. MLKPê ji bo şervanên ji welatên cuda Tabûra Azadîyê ya Navneteweyî(Enternasyonal) ava kir. Bi sedan şervanên navneteweyî ji bo şoreşê şer kirin. Milîsên Tevgera Şoreşa Yekbûyî ya Gelan ku partîya me

jî endama wê ye, bi sedan çalakîyên ku tirsa faşîzmê li bajarên Tirkîye û Kurdistanê belav dikin li dar xistin.Dema ku çeteyên DAIŞê bi fermana 74an êrîşî gelê Êzidî kir, partîya me jî di nava wan de bû ku banga alîkarîyê ya Şengalê bi cih anî. Şervanên me beşdarî pêngava rizgarkirina Şengalê bûn.

Tûgaya ku li Serêkanîyê bi navê yek ji fermandarên MLKPê Elîşêr Denîz hat avakirin, bi sedan şervan perwerde kir. Îro jî Tûgaya Sor li enîya Til Temir berxwedanê mezin dike. Di êrîşên li ser Efrîn, Serêkanîyê û Girê Spî da komunîstên şoreşger çeperên xwe yên berxwedanê neterikandin. Bi berdêla şehîdan bû parçeyek ji berxwedanê.

Komunîstan ji bo parastina şoreşa Rojava û ji bo sosyalîzmê çalakîyên xurt li dar xistin. Tevgera Komunîst a Şoreşger (TKŞ) ji bo pêşxistina xweparastina gel û şoreşê bigihîne gel hate avakirin. JKŞê û CKŞê teva hêzên din ên şoreşger beşdarî hemû çalakîyan bûn. Dema pêwîst bû xwe bi çek û sîlehan çekdar kir û berxwedan mezin kir. Ji pêşengên komunîst ên ciwan Elende El Muhammed yek ji şoreşgerên destpêkê bû ku dema şerê Serêkanîyê dest pê kir bi gotina "Em ê şoreşê biparêzin, em ê dagirkeran têk bibin" banga xweparastinê li gel kir.

